

## Li gundan kiryarên çeteyan zêde dibin

**Li herêmên di navbera Hêzên Leşkerî yên Minbicê û çeteyên tirk de şerên demkî rû didin û li gundên bakurê Minbicê kiryarên çeteyan zêde dibin.**



## Sûcên şer ên dewleta tirk tên nirxandin

**FORÛMA Paqijiya Etnîkî û Guhertina Demografîk a li Efrînê ya Navneteweyî dê îro bi dawî bibe. Di roja duyemîn de sûcên şer ên dewleta tirk hatin nirxandin û berdevkê YPG'ê Nûrî Mehmûd têkildarî sûcên şer raporek pêşkêşî beşdarên forûmê kir.**



## Li Efrînê 11 çete hatin kuştin

**YPG'ê diyar kir ku şervanan li navçeya Cindirês û li navenda Efrînê li dijî dewleta tirk û çeteyan çalakî li dar xistine û 11 çete hatine kuştin.**

# e-rojname

4 Kanûn - Sêşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 194



## Yekitî

Yekitiya Niştimanîya Kurdistan (YNK) di sala 1975'an de hatiye avakirin. Di nav PDK'ê de komek ku xwe wek çepgir û sosyalîst bi nav dikir di pêşengiya Mam Celal de YNK'ê ava dike. Partiyek ku xwe wek, demokratên sosyal û neteweperwer bi nav dike û endamê entenasyonala sosyal ye. Li herêma Soran bi taybetî Silêmanî û Kerkûkê xwedî hêz e. *Nivîsa Ercan Sezgîn / R.3*

# DILOP BÛ LEHÎ

Li dijî tecrîdkirina Ocalan grevên birçîbûnê roj bi roj zêde dibin. Leyla Guven ji bo girtiyên ku piştgirî dan çalakiya wê wiha got: "Ez jî dilopek ji behrê me. Tiştên we di nameya xwe de diyar kiriye îşareta mezinbûna vê dilopê ye."



## Hêrandina genim wek cejnê dibînin

Jinên kurd çanda xwe ya kevnar û xwezayî ji genim nîsk, birinc û savar ku di cuhnî de dikutin û bi destar dihêrin heta roja îro anîne. Jinên kurd bi taybetî jî genimê ku di cuhnî de dikutin û bi destar dihêrin di nava her xwarinekê de bi kar tînin û ji vî genimê ku dikin dahn bixwe jî xwarinê çêdikin. Li Colemêrgê jinan diyar kir ku rojên hêrandina genim mîna cejnan tên jiyîn... *RÛPEL - 2*

### KET ROJA 27'EMÎN

Hevseroka KCD'ê û parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 27 roj in di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Ji Torontoyê heta Ewropayê, ji bajarên Kurdistanê heta girtîgeh û meclisa Tirkiyeyê çalakiyên grevên birçîbûnê berfireh dibin.

### LI MECLISÊ GREV

Li Amed û Wanê çalakî hatin destpêkirin, li Hewlêrê komên nû grev dewr girtin û dê îro jî parlamenterên HDP'ê li meclisa Tirkiyeyê bikevin grevê. Li aliyê din li Mêrdîn jî tev li karvanên berxwedanê dibe. KCD'ê bi daxuyaniyekê hikûmet hişyar kir ku tecrîda li ser Ocalan bi dawî bike... *R.3*







## WhatsApp êdî bi kurdî ye!

Di warê teknolojiyê de pêşketinek din jî li kurdî zêde dibe. Sepana peyamşandinê û lêgerandinê WhatsApp Messenger ya ji bo telefonên jîr êdî bi kurdî ye. Naveroka hemû beşên WhatsAppê bi kurdî hat amadekirin. Kesên ku dixwazin WhatsAppê bi kurdî bi kar bînin dikarin peyda bikin û li ser teknisan.com'ê daxînin telefonên xwe... *RÛPEL - 6*

## Di bin çavan de grevê didomînin

Bi boneya piştgiriyê bidin çalakiya greva birçîbûnê endam û rêveberên HDP'a Mêrsînê li avahiya xwe ji bo 3 rojan dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn. Polîsan bi ser avahiyê de girt û 10 çalakger binçav kirin. Kesên ku hatin binçavkirin ragihandin ku rewşa wan baş e û di bin çavan de çalakiya greva birçîbûnê didomînin... *RÛPEL - 3*



## 'Êlek Zer'an Macron tengav kir


Li Fransayê çalakiya 'Êlek Zer'an ku ji ber zêdebûna bacên li ser petrolê û polîtîkayên hikûmetê tên lidarxistin berfireh dibe û dibe sedema krîza siyasî. Muxalefet daxwaz dike ku hikûmeta serokkomarê Fransayê Emmanul Macron bê feshkirin û hilbijartinên pêşwext pêk bên. Hikûmet li dijî vê daxwaza muxalefetê dertê û qebûl nake ku hilbijartinên pêşwext pêk bên... *RÛPEL - 4*




## Çapemeniya Azad bêdeng nabe

Platforma Jinên Rojnameger a Mezopotamyayê û Înîsiyatîfa Rojnamegerên Azad di 24'emîn bombekirina Rojnameya Ozgur Ulkeyê de li ber avahiya li Kadirgaya Stenbolê daxuyaniya çapemeniyê da û êrîş şermezar kir. Di daxuyaniyê de hat gotin ku nikarin bi bombekirin û kelepçeyan çapemeniya azad bêdeng bikin... *R.3*

## Veng bidêne vengê Leylaye




Hemsereka DBP ya Îzmîrî Melîs Akgule derheqê muhîmîya piştîdayîşê çalakîya Guvene ke kewta roja 27. de qisey kerde û dîyar kerde ke veng bidêne vengê Leyla Guvene... *RÛPEL - 5*

## Wa tecrîdî rê peynî biarîyo



Parlamenter Meral Beştaşe bale ante vero ke grevê vêşanîye yê hemverê Îmralîyî ke hetê Leyla Guvene ra ameyo destpêkerdene hemeyê Tirkîye de vila bibo ganî tecrîdê rê peynî biarîyo... *RÛPEL - 5*

www.arsivakurdi.org



## Li Çemçemalê ji bo jinan çalakiyên hunerî

**SILÊMANÎ** - Li navçeya Çemçemalê a Silêmaniyê di çarçoveya 25'ê Mijarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan a Cîhanê de ji bo jinan çend çalakiyên hunerî pêk hatin. Rêveberiya Rewşenbîrî û Hunerî ya Çemçemalê bi navê 'Nîşandana hunera jinan' çend rêzeçalakiyên hunerî ji bo jinan organîze kirin. Çalakiyên weke xwendina helbestan, muzîk, pêşangeha şêwekarî û hunerên destan ên ji aliyê jinan ve hatine çêkirin, pêk hatin. Jin dixwazin bi ev çalakiyên hunerî hêza xwe ya hunerî nîşan bidin.

# Modela hevserokatiyê cudahiyek e

Jinên siyasetmedar pergala hevserokatiyê nirxand û gotin ku pergala hevserokatiyê li dijî newekheviya zayendî cudahiyek e û destnîşan kir ku desthilatdar li ser pergala yekperestiyê rêveberiya xwe ava dike lê pergala hevserokatiyê li dijî pergala dewletê civakê diguherîne

Pergala hevserokatiyê di cîhanê de yekem car ji aliyê Partiya Kesk a Alman ve pêk hat. Li Tirkiye û bakurê Kurdistanê jî pergala hevserokatiyê di sala 2005'an de ji aliyê DTP'ê ve ket meriyetê. Pergala hevserokatiyê niha di tuzukên HDP, DBP û gelek saziyan de cihê xwe digire.

Jinên siyasetmedar pergal ango modela hevserokatiyê nirxandin û diyar kir ku modela hevserokatiyê li dijî pergala desthilatdar e.

Aktîvîsta Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan diyar kir ku wan di nava pergala hevserokatiyê de pozîsyona xwe girtiye û wiha got: "Em modela desthilatdariyê qebe û dagirker pênase dikin. Desthilatdarî li ser pergala yekperistiyê rêveberiya xwe ava dike. Modela hevserokatiyê li dijî pergala dewletê ya zilam di nava civakê de nêrînê diguherîne. Modela hevserokatiyê li dijî newekheviya zayendî cudahiyê diafirîne. Ev modela hevserokatiyê ne tenê ji bo jin û zilaman e. Di heman demê de ev model ji bo çand, dîn, ziman û netewe-yên cuda ye."



Di heman mijarê de hevseroka HDP'ê ya Amedê Fîlîz Buluttekîn jî destnîşan kir ku yek ji destkeftiyên herî mezin ê têkoşîna azadiya jinan modela hevserokatiyê ye û ev tişt anî ziman: "Model di çarçoveya têkoşîna azadiya kurd û paradîgmaya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de hatiye avakirin. Jin li her qadên jiyanê têdikoşin. Jin di nava jiyanê de, partiyên siyasî û li gelek qadan de xwedî biryara modela hevseroktiyê ne. Ev model jî yek ji bidestxistina herî mezin e. Modela hevserokatiyê nêrîna civakê ya desthilatdar û zilam guherand. Divê ji bo temsîliyeta hevserokatiyê jin ji bo bernamzetiyê serlêdanan bikin." *AMED*





## Komeleya Jinan a Rosa tê vekirin

Desthilatdara AKP'ê piştî ragihandina OHAL'ê û bi derxistina KHK'an her wiha bi tayînkirina qeyûman bi dehan saziyên jinan girtin.

Niha li Amedê bi armanca pêşî li îstîsmara zarokan û tundiya li ser jinan bê girtin Komeleya Jinan a Roza tê vekirin. Yek ji damezirînera komeleyê Adalet Kaya armanca vekirin û pêvajoya komeleyê vegot.

Kaya anî ziman ku hem tundiya desthilatdariyê hem jî tundiya OHAL'ê afirandiye heye û wiha got: "Hewldana rewakirina van polîtîkayan heye. Vê di civakê de tundiyek mezin derxist holê. Qeyûm tayînî şaredariyan hatin kirin. Gelek saziyên jinan hatin girtin. Êrîşî destkeftiyên jinan hatin kirin. Çapemenî alava herî mezin a tundiyê rewa dike ye. Alava duyem a alikariyê dide desthilatdariyê jî daraz e."

Kaya destnîşan kir ku dê di demek kurt de Komeleya Jinan a Rosa vebikin û ev tişt vegot: "Di civakê de hewcedarî bi komeleyên wisa heye. Li cihekî ku jin xurt bibe civak jî baş dibe. Ji ber vê yên herî zêde zextê dibînin jin in. Ji ber naxwazin civak baş bibe. Em ji vê re jî dibêjin tundiya siyasî. Li welat bûyerên îstîsmara zarokan, tecawiz û tundiyê pir zêde bûne. Ji ber vê me xwest em saziyek sivîl ava bikin. Me li ser vê daxwazê biryara avakirina komeleyê da. Em li komeleyê 7 kes in. Me bi 7 jinan re ava kir. Em ê ji bo hemû jinên cîhanê xebatan bimeşînin. Navê wê Komeleya Jinan a Rosa be." *AMED*

## 6 meh in li benda bersiva dewletê ye!

Meryem Tula ya ji aliyê hevjînê xwe ve rastî tundiya zayendî û fizîkî hat, 6 meh berê daxwaza parastinê kir lê hêj bersiva daxwaza wê nehatiye dayîn. Têkildarî mijarê Merve Tula axivî û diyar kir ku ew ji aliyê Ercument Tula ve rastî tundiya sîstematîk hatiye û da zanîn ku sînorê tundiyê tunebûye û carna heta mirinê lê xistiye. Tula daxuyand ku civak û malbat jî dîsa jinê sûcdar dibîne.

Her wiha Tula destnîşan kir ku daxwaza parastina wê jî nehatiye bicihanîn û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Bersiva 'Em di cînayetê toreyê de biryara parastinê derdixin. Divê tu li bendê bî' dan min. Em li bendê ne lê gelo garantiya ku em neyên kuştinê didin me. Divê dewlet di vê rewşê de ewil gumanbaran bigire. Hûn çima berdidin. Wê demê kuştina jinê rewa dibînin. Hevjînê min endamê MYK'a AKP'ê bû. Ji ber vê her tim ez dihatim tehdîdkirin." *ENQERE*



# Çanda hezaran salan didome

Jinên kurd çanda xwe ya kevnar û xwezayî bi genim nîsk, birinc û savarê ku di cuhnî de dikutin û bi destar dihêrin heta roja îro anîne. Jinên kurd bi taybetî jî genimê ku di cuhnî de dikutin û bi destar dihêrin di nava her xwarinekê de bi kar tînin û ji vî genimê ku dikin dahn bixwe jî xwarinê çêdikin. Jinên kurd ên li Colemêrgê ku heta roja îro vê çandê diparêzin dibêjin ku ew destûr nadin çanda wan di bin siya tenolojiyê de bimîne û dê heta dawiyê biparêzin.

**Ew roj wek jejnê bûn**

Nerîman Keskîn anî ziman ku dê tu car destûr nedin ku çanda wan a bi hezaran sal winda bibe û wiha got: "Ji berê de heya niha em bi cuhnî genime xwe dikutin û bi destar dihêrin. Ne tenê genim di heman demê de birinc,savar, nîsk û kunciyan jî em bi alîkariya cuhnî dinihêrin. Cuhnî û destar hêz û afirîneriya jinên kurd e. Ji berê de li gundan rojên hêrandinê hebûn. Jinên ku diçûn kutana genim hem dihatin gel hev, bi hev re dibûn alîkar û hem jî bi hev re li gel kilamên ku digotin kêfxweş dibûn. Ew roj mîna cejnan dihate jiyîn. Bi rastî ew roj xwedî wate bûn. Niha jî em bi wî awayî rojên genim hêrandinê li dar dixin. Divê em van rojan bidin jiyîn û bikin perçeyeke jiyanê."

**'Divê em çanda xwe biparêzin'**

Her wiha Asya Ozcan jî bal kişand ser çanda cuhnî û got ku divê jin destûr nedin ku teknolojî bikeve pêşiya çanda hezar salan û ev tişt anî ziman: "Em ji dayikên xwe fêr bûn. Niha jî di mala her kurdî de cuhnî û destar heye. Jinan bi kedê ev çand hûnandine. Ev jî bi keda mezin pêk hatiye. Niha jî li dijî hemû amûrên teknolojiyê dîsa em bi bikaranîna cuhnî çanda xwe ya kevnare didomînin. Bi pêşketina teknolojiyê çanda cuhnî divê têk neçe. Ger ku me ev çand ji bîr kir dê keda ku bi salan hatiya dayîn binpê bibe. Çanda me hebûna me ye, divê em biparêzin." *COLEMÊRG*



## Jinên ku li dijî faşîzmê têdikoşin rastî êrîşan tên

Ji bo destnedana 21 parlamenterên HDP û CHP'ê rabe 43 fezleke hatin amadekirin û pêşkêşî Serokatiya Meclisê hatin kirin. Di fezlekeyên hatine amadekirin de serokê CHP'ê Kemal Kiliçdaroglu û hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan jî heye. Parlamentera HDP'ê ya Êlihê Feleknas Uca ku der barê wê de 9 fezleke hatiye amadekirin, hemû bi hinceta bernameyên tev li bûye û axaftinên kiriye hatiye amadekirin.

Der barê mijarê de Feleknas Uca axivî û diyar kir ku fezleke di encama biryarek siyasî de hatine amadekirin û wiha got: "Axaftinên min ên di çalakiya Dayikên Şemiyê de, di 8'ê Adarê û konferansa Rêveberiyên Herêmî de û şandina nameyê ya der barê tecrîdê de ya ji Wezareta Dadê re bûye mijara fezlekeyê. Ev biryarek siyasî ye. Dixwazin xebatên me asteng bikin. Di 26'emîn parlamenteriya 11 parlamenterên HDP'ê hat xistin. Niha 9 parlamenterên me girtîne. Hevserokên me girtîne. Hemû ji ber axaftinên ku kirine. Em ji aliyê gel ve hatine hilbijartin. Gel em hilbijartine. Wê xebatên me û têkoşîna me bidome."

Uca destnîşan kir ku piranî fezleke der barê parlamenterên jin de ne û got ku di sê salên dawî yên li Tirkiyeyê de herî zêde li dijî polîtîkayên şer û faşîzmê têkoşîn dane û li eniya pêş meşyane jin in û ev tişt vegot: "Li welat tundiya li ser jinê û kuştinên jinan nasekine. Jin li kolanan tên qetilkirin. Li hemberî Dayikên Şemiyê êrîş pêk hatin. Di vî alî de jî herî zêde berê xwe didin jinan. Ji ber jin ji têkoşîna azadiyê natirsin. Em ê ji bo hemû jinan têkoşîna xwe mezin bikin. Jin bêdeng namînin, serî natewînin û dê têkoşîna me bidome." *ENQERE*

# 'Jinên kurd tu carî li dijî tu kesî serî natewînin'

Konferansa Qirkirina Nijadî û Guhertina Demografiya Efrînê ya Navneteweyî ku ji aliye Navenda Lêkolînên Stratejîk a Rojava ve hat organîzekirin, di 2'yê kanûnê de li bajarê Amûdê yê bakur û rojhilatê Sûriyeyê pêk hat.

Hevseroka Karên Hundir a Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Hêvî Mustefa der barê komcivînê de nirxand û wiha got: "Li dijî êrîş û hovitiya dewleta tirk jinên li Efrînê yên wekî Barîn Kobanê, Avesta Xabûr bi îradeyek xurt li ber xwe da. Vê yekê jî nîşan da jinên kurd tu carî serî natewînin."

Mustefa da zanîn ku di komcivînê de nîqaş û nêrînên girîng û berfireh derketiye holê û ev tişt anî ziman: "Ji bo çareseriyê di qadên siyasî, leşkerî, çandî, aborî de nîqaş û pêşniyar hatin kirin. Gelek rêxistinên jinan di şoreşa Rojava de berdêlên giran dan û bala cîhanê kişandin. Li ser esasê têkoşîna wan a giranbiha em di komcivînê de hewl didin ku pirsgirêkên heyî çareser bikin. Her wiha divê hemû jinên cîhanê li dijî hovîtiya dewleta tirk a li Efrînê derkevin." *QAMIŞLO*



www.arsivakurdi.org

# Grev di binçavan de jî didome

**Hat zanîn ku li Mêrsînê endam û rêveberên HDP'ê yên ku li dijî tecrîd û piştgirîdayîna Guven ketin grevê û hatin binçavkirin, di bin çavan de jî çalakiya xwe didomînin. Her wiha dê îro hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan jî têde 10 parlamenter ji bo 3 rojan li meclisê bikevin grevê**

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven li dijî tecrîdkrina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 27 roj in di çalakiya greva birçîbûnê de ye. Ji bo piştgirîdayîn Guven du roj berê li Mêrsînê 15 endam û rêveberên HDP'ê jî dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn. Lê di saetên êvarê de polîsan bi ser avahiya HDP'a Mêrsînê de girt û hevseroka HDP'a Mêrsînê Zuhal Onen jî di nav de 10 HDP'î binçav kiribûn.

Parêzerên ku bi muwekîlên xwe re hevdîtin pêk anîn, ragihand ku miwekîlên wan di binçavan de jî çalakiya xwe ya greva birçîbûnê dewam dikin û rewşa tenduristiya wan jî baş e. Parêzeran got ku dê miwekîlên wan heta 3 rojan çalakiya xwe dewam bikin.

Li aliyekî binçavkirina HDP'iyan didome û li aliyê din jî parlamenterên HDP'ê Fatma Kurtulan Ridvan Turan Tulay Hatîmogullari li avahiya HDP'a



Mêrsînê çalakiya greva birçîbûnê dewr girt. Gelek welatî hatin serdana HDP'iyan û piştgiriya xwe destnîşan kirin. *MÊRSÎN*



## Parlamenterên HDP'ê li meclisê dikevin grevê

HDP'ê biryar wergirt ku li dijî binçavkirina endam û rêveberên xwe dê çalakiya greva birçîbûnê berbelav bikin û bi vî awayî bersiv bidin. Di vê çarçoveyê de li gorî plansaziyê di qonaxa ewil de hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan jî di nav de 10 wekîlên HDP'ê dê li meclisê dest bi çalakiya greva birçîbûnê dest pê bikin. Çalakiya greva birçîbûnê dê îro piştî komcivîna HDP'ê ya li meclisê dest pê bike û 2 rojan dewam bike.

HDP'ê giştîname ji hemû rêxistinên xwe re şand ku 3 rojan dest bi çalakiyên greva birçîbûnê bikin. Rêxistinên bajaran ên xwe amade dikin jî dê ji 4'ê kanûn şûnde dest bi çalakiyan bikin. Her wiha li hemû bajarên ku parlamenterên HDP'ê lê hene jî dê çalakiyên greva birçîbûnê bên destpêkirin.

Her wiha têkildarî plansaziyan Maseya Krîzê hat avakirin. *ENQERE*

## Berxwedan berbelav dibe

Parlamenterên HDP'ê yên Amedê, li dijî tecrîdkirina Ocalan dest bi greva birçîbûnê ya ji bo 3 rojan kirin. Çalakî li Salona Konferansê ya Vedat Aydin a li avahiya HDP'ê ya bajêr dest pê kir. Wekîlên Amedê Selçûk Mizrakli, Dersim Dag, Remziye Tosûn, Semra Guzel, Mûsa Farisogûllari û Salîha Aydenîz tev li bûn. Wekîlên HDP'ê beriya çalakiyê daxuyaniyek dan çapemeniyê.

Parlamenter Selçûk Mizrakli daxuyanî da û bal kişand ser êrîşa polîsan a li greva birçîbûnê ya li Mersînê û anî ziman ku hikumeta AKP'ê bi van êrîşan neçareseriyê ferz dike.

Her wiha Mizrakli diyar kir ku ji bo dengê çalakgerên li dijî tecrîdê bedena xwe danîne ber mirinê, dest bi greva birçîbûnê ya ji bo 3 rojan dikin û bang li desthilatdariya siyasî kir ku bi erk û berpirsyariya xwe rabe.

**Beriya dîroka xwe çalakî**

Bi heman armancê li Mêrdînê jî greva birçîbûnê ya ku ji bo pişgiriya Guven dê di 7-8-9'ê mehê de dest pê bikira, piştî ku polîsan bi ser avahiya Mêrsînê ya çalakiya greva birçîbûnê lê hebû de girtin û 10 kesan binçavkirin, beriya dîroka xwe dê îro dest pê bike. Navenda HDP'ê ya Mêrdînê der barê mijarê de daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku dê li dijî tecrîdê û binçavkirina li Mêrsînê beriya dîroka ku hatibû diyarkirin dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya 3 rojan bikin.

**Dê çalakî bidomin**

Her wiha parlamentera HDP'ê ya Wanê Muazzez Orhan jî li dijî tecrîd û êrîşa li Mêrsînê li avahiya HDP'ê ya Wanê ji bo 3 rojan dest bi greva birçîbûnê kir. Têkildarî çalakiyê Orhan got ku heta daxwaza wan bên qebûlkirin dê çalakiya wan bidome. *AMED*



## KCD'ê hikûmeta tirk hişyar kir

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) li buroya xwe ya li Amedê têkildarî tecrîdê civîneke çapemeniyê li dar xist. Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk daxuyanî da û diyar kir ku Ocalan aktorekî sereke ye ku pêwîstiya gelên Rojhilata Navîn pê heye û wiha got: "Ji bo şerê hegemonîk ê li Rojhilata Navîn veguhere pêvajoyeke aştiyane û demokratîk, birêz Ocalan xwedî roleke diyarker e."

Berdan Ozturk anî ziman ku niha ji her alî ve operasyonên qirkirina siyasî li dijî siyaseta kurd a demokratîk tê kirin



û ragihand ku operasyonên qirkirina siyasî hewldana ji bo temamkirina tecrîda girankirî ye û wiha domand: "Rabûna li ber tecrîdkirina birêz Ocalan û şikandina tecrîdê, azadiya birêz Ocalan pîvan û cewhera exlaqî ye ji bo parastina pêşeroja demokratîk a gelên Rojhilata Navîn e. Hevseroka KCD'ê birêz Leyla Guven di vê çarçoveyê de bang li me, gelê me û civaka navneteweyî kiriye ji bo xwedî li erk û berpirsyariyên xwe derkevin. Heta helwest li dijî tecrîdê neyê nîşandan dê têkoşîna demokrasî û aştiyê bi ser nekeve. Ev yek careke din anî bîra me."

Her wiha Ozturk li dijî tecrîdkirina Ocalan bang li gelê kurd, demokratan û civaka navneteweyî kir da ku bikevin nava liv û tevgerê. *AMED*



## Ger tecrîd ranebe dê çalakî veguhere çalakiya bêdem

Girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê yên li girtîgehên bakurê Kurdistanê û Tirkyeyê ji bo dawî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bê, di 27'ê Mijdarê roja salvegera damezrandina PKK'ê de dest bi greva birçîbûnê ya 10 rojan a dorveger kiribûn. Piştî daxuyaniya Denîz Kaya li gelek girtîgehan koman bi dorveger dest bi çalakiyê kir. Li Girtîgeha Tîpa E ya Giresunê jî grev bi koma ewil a ji 3 kesan pêk tê di roja 8'an de berdewam dike. Çalakiya ewil ji aliyê girtiyên siyasî Mehmet Çagirici, Behrî Sulgin û Umit Karakaya ve hat destpêkirin. Mehmet Çagirici bi rêya telefonê der barê çalakiyê de agahî da. Keça Mehmet Çagirici, Birgul Çagirici anî ziman ku bavê wê diyar kiriye ku dê 7 kom, her komek 10 rojan dorveger têkevin grevê û ger daxwaza wan pêk neyê û tecrid bi dawî nebe dê piştî koma 7'an dest bi çalakiya bêdem û bêdorveger bikin. Çagirici bang li parazvanên mafên mirovan, rêxistinên demokratîk û partiyên siyasî kir ku li hemberî daxwaza girtiyan hestiyar tev bigerin û deng bidin dengê girtiyan. *GÎRESÛN*

## 'Em li dijî êrîşan bûn bi hezaran'

Platforma Jinên Rojnameger a Mezopotamyayê û Înîsiyatîfa Rojnamegerên Azad di 24'emîn bombekirina Rojnameya Ozgur Ulkeyê de li ber avahiya li Kadirgaya Stenbolê daxuyaniya çapemeniyê dan û êrîş şermezar kirin.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku Ozgur Ulke bi têkoşînek mezin hatiye vekirin û ev tişt hat gotin: "Di bin êrîş û gefan de Ozgur Ulke di 28'ê Nîsana 1994'an de dest bi weşanê kir. Piştî weşanê 239 roj şûnde di 3'yê Kanûna 1994'an de avahiya rojnameyê ya teknîkê ya li Kadirgaya Stenbolê, navenda buroyê ya li Bagaogluyê û Buroya Enqereyê bi awayekî hemwext hat bombekirin. Peywirdarê ragihandinê Ersîn Yildiz di encama êrîşê de jiyana xwe ji dest da. Li dijî kujeran tu mudaxele nehat kirin lê xebatkarên rojnameyê piştî ku li nexweşxaneyê hat tedawîkirin şûnde hatin binçavkirin. 24 sal in ku tu encam ji lêpirsîna di der barê bûyerê de hat kirin, nehat girtin."

Di daxuyaniyê de hat gotin ku ew bi bombeyan naqedin û ew bûne hezar û li dijî wan disekinin.

Piştî axaftinan rojnameger çûn ser gora xebatkarê rojnameya Ozgur Ulkeyê Ersîn Yildiz û ew bi bîr anîn. Rojnamegeran qurnefil danîn ser gora Yildiz.





Her wiha HDP'ê jî têkildarî bombekirina Rojnameya Ozgur Ulke daxuyaniyek da û ev tişt vegot: "Bi êrîşên li ser çapemeniya azad ên berdewam dikin, dixwazin rastî di tariyê de bimîne. Lê çapemeniya azad tu carî bêdeng nebû û dê bêdeng nebe." *STENBOL - ENQERE*

## Daxwaza Leyla Guven daxwaza milyonan e

Kurdên li bajarê Hîldesheîm ê Almanyayê li avahiya Dîe Lînke li dijî tecrîda li ser Ocalan greva birçîbûnê ya 5 rojan dan destpêkirin. Di nava çalakgeran de Parlamentera berê ya HDP'ê Leyla Bîrlîk jî cih digire. Çalakvanên ku dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin ev peyam da: "Daxwazên Leyla Guven daxwazên me û milyonan kurdan e. Tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî tecrîda li ser gelên Rojhilata Navîn, gelê kurd û hemû mirovahiyê ye." *HÎLDESHEÎM*



WÊREK
Ercan SEZGÎN



## Yekitî

Yekitiya Niştimanîya Kurdistan (YNK) sala 1975'an de hatiye avakirin. Di nav PDK'ê de komek ku xwe wek çepgir û sosyalîst bi nav dikir di pêşengiya Mam Celal de YNK'ê ava dikin. Partiyek ku xwe wek, demokratên sosyal û neteweperwer bi nav dike, endamê entenasyonala sosyalîst e. Li herêma Soran bi taybetî Silêmaniyê û Kerkûkê xwedî hêzek e. YNK her çiqas li herêmek bi sînor be jî, di doza neteweya Kurdistanê de bandorek wê ya mezin heye. Hizbeke mezin a siyasî ya Kurdistanê ye. Di têkoşîna neteweya Kurdistanê de, têkoşînek mezin û berdêlên giran dane. Di van deh salên dawî de ji ji bo yekitîya kurd were avakirin jî seknek baş û neteweyî nîşan daye. Bi hêz û tevgerên din ên Kurdistanê re her tim alîgir û xwedî helwest bû. Gotina Mam Celal ku gotibû "em pişikek kurd dahî nadin wê" di bîra hemû kurdan de ye.

Lê bûyerên ku di demên dawî de diqewimin, ji mirovan re hin şik û guman çêdike. Tê xuyakirin ku yekitî, ji sekna xwe ya ku di van salên dawî de nîşan daye, dûr dikeve. Di rojên dawî de hêzên asayîşa YNK'ê, li cihên wek Ranya, Koyê, Kifrî, Kelar û Silêmaniyê êrîş bir ser hin sazî, dezgeh û tevgerên siyasî. Li gelek cihan, ofîsên Tevgera Azadî û Tevgera Jinan girtin. Dibêjin ku ev sazî û partî, bê destûr hatine vekirin û ji Wezareta Karên Hundir destûr wernegirtine. Ger wiha be jî ev 4 sal e ev tevger û sazî hene. Çima heta niha deng nehate derxistin û ji wan re nehate gotin ku kêmasiyên xwe yên qanûnî temam bikin. Xuya ye ku hincet û hin guhertinên polîtîk hene. Hiqûqê jî ji van guhertinên polîtîk re dikin amûr.

Piştî van bûyeran, malper û rojnameyên nêzî PDK'ê, hin îdia avêtin holê. Tê gotin ku piştî bûyerên Kerkûkê, MÎT'a tirk pavel Talabanî vexwendiye Tirkiyeyê û hevdîtin hatine çêkirin. Dîsa tê gotin ku di 4'ê cotmehê de MÎT'a tirk û Pavel Talabanî hevdîtinek çêkirine û hin peyman hatine çêkirin. Dîsa dibêjin ku dema Mevlut Çavuşoglu hatiye Iraqê, bi Berhem Salih re hevdîtin çêkiriye û di wê hevdîtinê de Pavel Talabanî jî hebûye. Dîsa Bas News îdia dike ku YNK xwe ji operasyona Qendîlê re amade dike. Ev hemû îdia ne, çiqas rast derew em nizanin. Lê piştî van bûyeran daxuyaniya ser balyozxaneya tirk a Hewlêrê balkêş bû. Ji YNK'ê re spas kir û got ne bes e, divê hin gavên din jî werin avêtin. Piştî van daxuyaniyan çû Kerkûk û li wê derê bi tirkmenan re civîn û hevdîtinan çêkir. Ev jî dide xuyakirin ku li pişt perdê, hin plan, peyman û hevdîtin hatine çêkirin û xwe gihandine hinek encaman. Ger bi dewleta tirk re hin peyman hebin ev xizmet ji gelê kurd re nake. Ji ber ku dewleta tirk, dewleta Erdogan û Bahçelî, ew jî nijadperestê tirk in û neyarê gelê kurd ên herî mezin in. Yên ku Başûr dagirkirî yên li Rojava gefan dixwe û her roj êrîş dike dewleta tirk e. Naxwaze pisîkek kurdan jî hebe. Bi neyarî gelê kurd ên herî xedar re, li ser hîn berjewendiyên aborî, firotina hêzê kurdistanî li derveyî xeta neteweyî çepgirî û sosyalîstî ye. Li derveyî xeta Mam Celal e ku gotibû ez pisîkek jî nadim. Ji ber ku dewleta tirk ew qas neyarê gelê kurd ku pisîka kurd jî bibîne wê bixeniqîne. Bi Bahçelî û Erdoganî re hevdîtin û peyman li dijî doza Kurdistanê ye.

www.arsivakurd.org

## Di meha mijdarê de 41 kesan jiyana xwe ji dest daye

United Nations Assistance Mission for Iraq (UNAMI)

**BEXDA -** Nûnertiya Neteweyên Yekbûyî ya Iraqê (UNAMI) bi raporekê bîlançoya meha mijdarê ya kesên li Iraqê di bûyerên tûndiyê de jiyana xwe ji dest daye û birîndar bûne aşkera kir. Li gorî rapora ku hatiye aşkerakirin di meha mijdarê de li seranserê Iraqê 41 kesên sivîl jiyana xwe ji dest daye û 73 kes jî birîndar bûne. Li gorî raporê, 6 mehên borî bîlançoya herî kêm e ango meha ku herî kêm xwîn rijaye ye. Ji şerê 2003'yan ve her roj li Iraqê bi dehan kes ji ber êrîş û teqînên ku pêk tên, birîndar dibin û jiyana xwe ji dest didin.

# Çalakiya 'Êlek Zer'an bû sedema krîzê

Çalakiya 'Êlek Zer'an li Fransayê rê li ber krîza siyasî vekir. Muxalefeta Fransayê ku piştgirî dide çalakiyê ji hikûmeta Fransayê daxwaz kir ku xwe fesh bike û biryara hilbijartinên pêşwext bide. Li ser vê yekê serokkomarê Fransayê Macron biryar da ku hikûmet bi çalakger û mauxalefetê re rûnê û çareseriyekê bibîne



Li Fransayê çalakiya 'Êlek Zer'an ku ji ber zêdebûna bacên li ser petrolê û polîtîkayên hikûmetê tên lidarxistin berfireh dibe û dibe sedema krîza siyasî. Muxalefeta Fransayê jî piştgiriya çalakiyên dike û daxwaz dike ku hikûmeta serokkomarê Fransayê Emmanul Macron bê feshkirin û hilbijartinên pêşwext pêk bên. Hikûmet li dijî vê daxwaza muxalefetê dertê û qebûl nake ku hilbijartinên pêşwext pêk bên.

Li gel vê yekê jî li gorî çapemeniya Fransayê paş de gav avêtiye û bi hikûmeta xwe re civînek li darxistiye. Macron di civînê de ji wezîrê xwe yê karên hundir xwestiye ku bi çalakgerên 'Êlek Zer' û muxalafetê re bikeve nav diyalogê û daxwazên wan gotûbêj bike. Li gel van hewldanên Macron jî çalakî bi dawî nabin. Her ku diçe çalakî bi beşdariyên nû berfirehtir dibin û li seranserê Fransayê berbelav dibin.

Herî dawî roja şemiyê di serî de li paytext Parîsê û tevahiya welat çalakî hatibûn lidarxistin û hêzên ewlehiyê yên Fransayê bi awayekî tund dest li çalakiyan werdabûn. Li gel vê destwerdana polîs û leşkeran jî heta derengiya şevê çalakvanan kolan neterikadibûn û li kolanan bend û senger danîbûn û bi polis û leşkeran re şer kiribûn. Her wiha çalakvanan seyare, şaxên bankayan, firoşgehan dabûn ber agir û hilweşandibûn.

Wezareta Karên Hundir angaşt kir ku li tevahiya welêt 136 hezar kes beşdarî van çalakiyan bûne. Lê hejmara rast herî kêm bi du caran li van daneyên wezaretê bû. Di çalakiyên ku 3 hefte ne rojên şemiyê bi girseyî pêk tên, hema bêje her roj li rêyên giştî yên seyareyan çalakiyên blokajê tên kirin. Li gorî daneyên fermî hezar û 94 kes ketine ber lêpirsînê û 630 kes jî hatine binavkirin. Her wiha di çalakiyan de herî kêm 282 kes jî birîndar bûne.

Li gorî agahiyên li ber dest dê hikûmet ji pêkanaîna çareseriyê bi partiyên mualefetê û nûnerên çalakgeran re rûnê. Heke hikûmet daxwaza çalakgeran a kêmkirina bacên sotemeniyê qebûl bike, dibe ku hevdîtin bi erênî derbas bibin û çareserî ji çalakiyan re bê dîtin û çalakî bi temamî bi dawî bibin. Heke berovajiyê vê yekê pêk bê û hikûmet xwe nede ber daxwazên çalakgeran dibe ku çalakî hê xurttir bibin û berbelav bibin. *PARÎS*

# Jin dibin mexdûrê şerê navxweyî

Li Sûdana Başûr ji sala 2013'an ve şerê navxweyî heye. Serokkomar Salva Kîîr ji bo bidawîkirina şerê ku di meha îlonê de bi pêşengên raperînan re peymana aştiyê îmze kir. Li gel vê yekê jî şerê navxweyî yê li welat bi dawî nebû û tundiya ji ber pêkanînên her du aliyan jî bêdidome. Şerê navxweyî herî zêde jî bandorê li sivîlan dike. Ji ber şer nêzî 4 milyon mirov bê cih û war mane. Li gel tundiyê birçîbûn ango xela jî li welat zêde bûye.

Li aliyê din mexdûrên sereke yên vê şerî jin in. Li welat êrîşeke mezin a zayendî li ser jinan heye. Rûth Okello ku bi Rêxistina Doktorên Sînornenas (MSF) a Sûdana Başûr re dixebite têkildarî êrîşên zayendî yên li ser jinan daxuyaniyek da. Okello diyar kir ku li welat gelek jin bûne hedefa êrîşên zayendî û wiha got: "Jin û zarokên keç ên bûne hedefa êrîşên zayendî, bi rengekî komî serî li navenda tenduristiyê ya MSF'ê ya li bajarê Bentîûyê dane."

Okello asta êrîşên zayendî yên li welat bi bîr xist û da zanîn ku jinên dûcanî jî dibin hedefa êrîşên zayendî û ev tişt anîn ziman: "Di nav kesên ku dibin hedefa êrîşên zayendî de zarokên qumatkê bigire heta jinên 65 salî jî hene. Zêdeyî 3 sala ne li Sûdana Başûr kar dikim. Min tu carî hejmareke ewqasî zêde ya mexdûran nedît ku serî li navenda me ya tenduristiyê didin." Okello anî zman ku di navbera 19 û 29'ê mijdarê de alîkarî û tedawiya lezgîn dane 125 jinan."

Okello di berdewamê de ji destnîşan kir ku ji bilî êrîşên zayendî jin rastî êrîşên fizîkî yên mîna destdirêjiyê bi qemçî, ço û qundaxa çekê hatine. Okello herî dawî bang kir û xwest ku êrîşên zayendî û fizîkî yên li dijî jinan bên rawestandin. *CÛBA*



# Talîban bi dehan ajokar revandin


Li Afganistanê li gel hewdanên aştiyê jî êrîşên Talîbanê yên li dijî gelê Afganistanê bi dawî nabin. Çekdarên Talîbanê li bajarên Derê Sof û Belxê yên parêzgeha Semenganê bi dehan ajokarên kamyonan û şagirtên wan revandin. Serokê parêzgeha Semengan a Afxanistanê Mihemed Sidîq Ezîzî têkildarî mijarê ji BBC'ê re axivî û têkildarî revandinê agahî par ve kirin.

Ezîzî ragihand ku çekdarên Talîbanê li ser rêka bajarên Derê Sof û Belx pêşiya kamyonên ku komir birine Belxê girtine û 60 ajokar û 60 şagirtên wan revandine. Ezîzî da zanîn ku çekdarên Talîbanê piştî çend saetan şagird berdane lê ajokaran bi xwe re birine cihekî ne diyar. Berdevkê polîsan ê parêzgehê Munîr Rehîmî jî diyar kir ku çekdarên Talîbanê ji bona wergirtina bacê ajokaran revandine. *KABÎL*



# Amerîka danekirinên nû amade dike

Amerîkayê bi hinceta bûyera jehrîkirina ajanê berê yê rûs Sergey Skripal û keça wî li dijî Rûsyayê paketeke nû ya danekirinan amade kir. Wezareta Karên Derve ya Amerîkayê têkildarî mijarê ragihand ku ew dê girêdayî bûyera jehrîkirina Skripal ku Rûsya pê tê tawanbarkirin, danekirinên nû ji bo Rûsyayê bisepînin. Wezaretê di daxuyaniya xwe de da zanîn ku naxwazin li dijî Rûsyayê danekirinan pêk bînin lê neçarin ku qanûnên xwe bi cih bînin. Hat diyarkirin ku dê danekirinên nû li ser çend karsazên rûsî werin sepandin. *WASHINGTON*



# Metirsiya avabûna hêzeke çekdar a nû heye!

Efserê kurd ê artêşa Iraqê yê bi navê Raîd Emîn Şêxanî li ser îhtimal rêxistibûna hêzên çekdar ên li nav Iraqê angaştên balkêş avêtin holê. Şêxanî angaşt kir ku hebûna rêjeyeke mezin a hêzên çekdar li Iraqê bûye metirsî bo ser jiyana hemwelatiyan û bi berdewamî kiryarên terorîstî pêk tên.

Şêxanî diyar kir ku roj bi roj metirsî li ser jiyana hemwelatiyan ava dibe û wiha got: "Li Iraqê ji ber ku roj bi roj rewşa ewlehiyê ber bi xerabûnê ve diçe, metirsiya avabûna hêzeke çekdar a nû heye. Ji aliyekî ve DAIŞ metirsî ye û ji aliyekî din ve jî metirsiya avabûna hêzeke nû ya çekdar heye." *BEXDA*



# Qetarê xwe ji OPEC'ê vekişand

Welatên endamê Rêxistina Welatên Petrolê Îxrac Dikin (OPEC) ji bo civîna xwe ya dawiya salê dê di demeke nêz de li hev bicivin. Di demeke wiha ku welatên OPEC'ê li hev bicivin de yek ji welatê endamê yê girîng Qetar biryar da ku ji OPEC'ê veqete. Wezîrê Enerjiyê yê Qetarê Saad El Kaabî têkildarî mijarê daxuyaniyek da û diyar kir ku di meha çileyê ye sala nû de xwe ji OPEC'ê vedikişînin.

Kaabî di berdewamê de da zanîn ku biryara xwe ya veqetandinê ji OPEC'ê re jî ragihandine û ev tişt anîn ziman: "Wek her welatekî ku ne endamê OPEC'ê ye em ê jî sozên ku me dane pêk bînin. Qetar jî wek welatên din dê petrolê bikire û bifiroşe û wekî ku ji OPEC'ê re misoger kiribû dê heta 19'ê çileya 2019'an sozên xwe bi cîh bîne." Piştî vê biryara Qetarê nirxê petrolê ji sedî 5 zêde bû.

Qetar rojê 656 bermîl pertrol hildiberîne. Ji ber vê rêjeya hilberandinê biryara Qertarê welatên endamên OPEC'ê matmayî hişt û li hemû welatan bû rojeve sereke. Qetar beriya 57 salan bûbû endamê OPEC'ê. *DOHA*




# Dadgehê rayeyên serokwezîrê Srî Lankayê Rajapakse da sekinandin

Dadgeha Îstînafê ya Srî Lankayê bi hinceta ku 'dikare xisaran bide welat' rayeyên serokwezîr Mahînda Rajapakse da sekinandin. Di 26'ê cotmehê de serokkomarê Srî Lankayê Maîthrîpala Sîrîsena serokwezîr Ranîl Wîckremensînghe ji peywirê girt û li şûna wî Mahînda Rajapakse ji bo serokweziriyê peywirdar kir. Ji ber vê peywirdarkirinê ji meha cotmehê ve li Srî Lankayê krîza siyasî heye.

Serokwezîr Rajapakse ku rayeyê wî jê hatiye stendin, bi hinceta ku ev biryar li dijî Destûra Bingehîn e red dike ku dev ji wezîfeya xwe berde. Serokkomar Sîrîsena di dawiya meha mijdarê de bi armanca ku hilbijartineke giştî were lidarxistin, parlemento fesh kiribû. Dadgeha Bilind ev biryar betal kir û ferman da ku bila amadekariyên hilbijartinê werin sekinandin.

Hefteya borî gelek parlementeran nerazîbûn nîşan da ku Rajapakse dev ji biryarê bernedaye. Dadgeha Îstînafê mudaxeleyî vê rewşê kir. Parlamentoyê hemû îhtîmalên ku Rajapakse dikare fonan xerc bike, ji destê wî stendibû. *COLOMBO*



www.arsivakurdi.org

# Kirmanckî





## Citkaranê Dêrazîrî rê toximê xele vila kenî

**DÊRAZOR -** Komîteya Berardişî ya Dêrazorî 686 ton toximê xele citkaran rê vila kerde. Komîteye bi armancê averberdişê berardişî dewanê Rojhelat û Rojawanê Dêrazorî de dest bi xebatan kerde û hema zî xebatê vilakerdişê toximê xeleyan dewam kenî. Komîteya Berardişî gama yewin de 40 ton toximê pak û bejingkerde vila kerde. Yeno zanayene ke vayeya toximan sûka reş de heta resena 200 lîreyê Sûrîye. Hemserekê Komîteya Berardişî Mihemed Ezîzî dîyar kerd ke xebatê înan dewam kenî.



# Wa tecrîdî rê peynî biarîyo

Parlamentera HDPyî Meral Beştaşe dîyar kerde ke vero ke grevê vêşanîye ke hetê Leyla Guvene ra ameyo destpêkerdene hemeyê Tirkîye de vila bibo, ganî tecrîdê rê peynî biarîyo û va: "Leyla Guvene heqdar a. Ganî tecrîd tavilî bêro wedartene."

Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalano ke 15ê sibata 1999î ra nata Girawa Îmrali de binê tecrîdêko giran de yo, 27ê temmuza 2011î ra nata nêşêno avûkatanê xo reyde, 11 êlula 2016î ra nata zî nêşêno keyeyê xo reyde pêvînayîş bikero. Ocalan tewr peynî 11ê Êlula 2016î de pêvînayîşêko kilm viraştbî û o wext ra nata ti xebere tira nîna girewtene. Hemsereka Kongreya Komelê Demokratîke (KCD) û Parlamentera HDPyî ya Colemêrgî Leyla Guvene seba ke tecrîd bêro wedarnayene 8ê teşrîna peyêne de dest bi grevê vêşanîye kerdbî.

Parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Meral Beştaşe derheqê tecrîdê serê rayberê şarê Kurdî Abdullah Ocalanî de û grevanê vêşanîyan de qisey kerde. Beştaşe va 'waştişê Guvene waştişê înan ê' û wina domnaye: "Tecrîdo mutleq yo hemverê birêz Ocalanî tenya hemverê ê de nêyo, eslê xo de 80 mîlyon hemwelatijan eleqedar keno û hemverê ameyoxê Tirkîye de yo."






**Ganî meclîs Guvene rê cewab bibo**

Beştaşe dewamê qiseykerdişê xo de ard ziwan ke heta roja 27. ya grevî zî hetê îqtidarî ra derheqê grevî de tu eşkerayîyêk nêamîya dayene, tu gamêk nêerzîyaya û no hal nêno qebûlkerdene. Beştaşe bale ante serê vilabîyayîşê grevanê vêşanîyan û va: "Seba paştidayîşî do çar dorê welatî de hetê HDPyî ra grevê vêşanîye bêrê destpêkerdene. Vero ke nê grevê vêşanîyî hemeyê Tirkîye de vila bibê ganî tecrîdê rê peynî biarîyo. Leyla Guvene heqdar a; ganî tecrîd tavilî bêro wedartene."

Beştaşe derheqê qerarê Mehkemeya Heqanê Merdiman a Ewropa (MHME) yê seba tavilî veradiyayîşê hemserekê HDPyî yo verên Selahattin Demîrtaşî de ke hetê mehkemeya Tirkîye ra no waştiş amebi redkerdene vat "no qerarê redkerdişî hetê mehkeme ra nê hetê Erdoganî ra girîyayo. Ver bi nizdbîyayîşê tarîxê weçînitişê vêşîbîyayîşê tepiştişan ser o vinderte. Rixmê nê zextan de zî do îqtîdarê AKPyî nêreso serfirazî. Ma ancî meclîsî de yê, şaranê Tirkîye de yê. Nê weçînitişan de zî do nêeşkê verniya ma bigîrê, ê qeyûmî do şirê. " *STENBOL*

## Veng bidêne vengê Leylaye



Hemsereka Kongreya Komelê Demokratîke (KCD) û Parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Colemêrgî Leyla Guvene seba ke tecrîdo ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser o yeno domnayene şermizar bikera, 8ê teşrîna peyêne ra nata Zindanê Tîpa Eyî yê Amedî de grevê vêşanîye de ya. Roniştişê doza Guvene tewr peynî 7ê teşrîna peyêne de 9. Mehkemaya Cezaya Giran ya Amedî de pê ameybî û 8ê teşrîna peyêne de zî dîyar kerde ke aye do bikewa grevê vêşanîye.

Hemsereka Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) ya Îzmîrî Melîs Akgule derheqê muhîmîya piştidayîşê çalakîya Guvene ke kewta roja 26. de qisey kerde û dîyar kerde ke tecrîd parçeyê polîtîkayê şer û şîdetê dewlete yo.


Melîse qiseykerdişê xo de ard ziwan ke eke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî reyde muzakere dest pêbikerî do heme şarî feyde bigîrî û tecrîd tena zirar nêdano kurdanî eynî wext de zirar dano pêroyê Rojhelato Miyanênî û Dinya. Melîse dewamê qiseykerdişê xo de wina va: "Tecrîdo ke Abdullah Ocalanî ser o yeno domnayene îmha û înkarkerdişê şarê kurdî ra cîya nîyo. Sîstem sere de Îmralî û dima ra pêroyê şaran ser de bîyayeyê xo domneno. Îqtîdar vera hende israrê şaran û Abdullah Ocalanî de maseya muzakereyî qalibna. Îzmîr, Stenbol û Amed veng bidêne vengê Leylaye." *ÎZMÎR*

## Berê sînor padayî feqîrî dest pêkerd

30 dewê girêdayeyê qezaya Elbakî yê Wanî sînorê Îranî ser de yî. Nê dewî miqabilê bajarê Salmasî yê Îranî yî. Pêroyê nê dewan girêdayeyê Berê Sînor yê Xanesorî yî.

Bi serran o bero ke tede bazirganî ameyêne kerdiş padayeyo. Astengkerdişê berê sînorî tesîrê xo dano hemwelatiyanê dorme ke bi bazirganî debara xo kenî ser. Hemwelatîyî dîyar kerdî ke 10-15 serrî yo ke ber padayeyo û cok ra ê nêeşkenî bazirganî bikerî. Çinbîyayîşê karî vera ciwanê dewan zî verê xo danî bajaranê pîlan.

Nê dewan ra yew zî dewa Taxikî ya û hemwelatîyê dewe ra Mesut Ozdemîr, Mutallîp Akkaya û Mehmet Salîk Akkayo 80 serrî qisey kerdî. Hemwelatîyî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Verê cû merdimê ma yê Rojhelatî eşkayêne şêrî û bêrî. Ma bazirganî kerdêne. Ma bi bazirganîya mazot û benzînî debara xo kerdêne. Tewr peynî 2008î de 5 hemwelatîyê dewe bazirganî vera hetê leşkerê Îran û Tirkîye ra ameybi birîndarkerdene. Êdî nê dewan de destûr nêdîyeno bazirganî. La leşkerî vengê xo bazirganîya merdiman rê nêkenî." *WAN*



## Karkerê grîpînî yewin rey grev de yê




Grîpîn Îlaç A.Şî 23 serrî yo ke qezaya Avcilarî ya Stenbolî de berardiş keno. Fabrîqa de 82 kesî xebetîyenê û nîmeyê înan cinî yê. Karkeran se ra 25 zam waştî û patronan zî se ra 17 pêşnîyar kerdî. Karkeran nê qebul nêkerdî û dest bi grev kerdî. Kargerê ke nika grev de yê dîyar kenê ke heta zamê ke wazenê nêro dayîş do fek grevê xo ra vera nêdê.

Karkeran ra Vîldan Ozgura ke 11 serrî ya fabrîka de xebetîyena, Nuray Yilmaza ke 23 serrî ya fabrîka de xebetîyena, Guleser Akina ke 22 serrî ya xebetîyena û Endama Meclîsê Cinîyan ya Karkeran Fidan Ataselîme qisey kerdî.

Cinîyî qiseykerdişê xo de wina vatî: "Krîz cuye zehmet kerdo. Rewşa karkeran zehmet a. Do heta key na rewşe dewam bikera. Xora kîra binê hezar û 500î de zî bîya. Ma se ra 25 zam waşt, la no zî kêm o. La patron no zî zêde vîneno. Serra vîyarte de se ra 17 zam kerdbî. Ma mecbur mendî ke grev bikerê. Nimeyê karkerê ke grev de yê cinîyê. Karkerê Metalî senî qezenç kerdî se do karkerê grîpînî zî do serkewte bibê." *STENBOL*

## Merkezê weşî paweyê kadroyan o

DAIŞ heme cayan û taybetî merkezê weşî yê herêma Dêrazorî kerdbî hedef. Hemwelatîyê dewa El-Seiwa û dorme ci çinbîyayîşê merkezê weşî vera zehmetî anceni û nuqtaya weşî ya tewr nizdî bajarê El-Kesra de ya û 20 km dûrê înan a. Waştişê hemwelatîyan ra dima Meclîsê Şehîd Nedîm El-Şerîdî merkezê weşî restore kerd û heme hetan ra seba hizmetdayîşî amade kerd. Nika tena hetê kadro û darûyê weşî de kêmanî estî.



Hemwelatîyê dewe dîyar kerdî ke 7 serrî yo ke merkezê weşî çin o û ê cok ra mecbur manenî ke şêrî bajarê Reqqa. Nêweşê ke rewşa înan xira zî rayîr de mirenî. Nufûsê dewe koçkerdiş ra ver 12 hezar bî, la nika bîya 15 hezar. Derheqê babete de Serekê Komîteya Xizmetdayîşî yê Meclîsê Şehîd Nedîm El-Şerîdî yê dewa El-Seiwa Zekeriya El-Essafî qisey kerd. El-Essaf kesê ke piştî dayî rê spasî kerd û dîyar kerd ke merkezê weşî de tena kêmanîya kadroya weşî esta. *DÊRAZOR*

## Ewropa de Roşanê Ganebîyayîşî yeno pîrozkerdene

Seranserê Ewropa de serragêrayîşê ronayîşê 40. yê PKKyî sey Roşanê Ganebîyayîşî yeno pîrozkerdene.

Xeylê bajaranê Almanya, Fransa û Swîsre de Roşanê Ganebîyayîşî ame pîrozkerdene.

Bajarê Hamburgî yê Almanya de Kurdistanijan û dostanê înan bicoş a Roşanê Ganebîyayîşî pîroz kerd. Şewe de sîyasetmeradaran ê kurdan ra Mehmet Aktaşî qisey kerd. Bajaranê Freîburg û Lahrî de zî bi heman waştişî şewêk ameye viraştene.

Şewe de mesajê girdkerdişê mucadeleyî ame dayene û bi kilamanê şorişgêrîyan û govendî roşan ame pîrozkerdene.

Bajarê Goteborgî yê Swîsre de bi şewêk û fîşeganê hewayîyan Roşanê Ganebîyayîşî ame pîrozkerdene. Kurdistanijan a pîya xeylî rêxistinê komelanê sivîlan û sîyasetmedarê Swîsre tewrê şewe bîyî û mesajê paştidayîşê PKKyî û şarê kurdî dayî.

Bajarê Fribourgî de zî bi hezaran Kurdîstanijî û dostê înan ameyî têhet û bi slogana 'PKK şar o şar tiya de yo' Roşanê Ganebîyayîşî pîroz kerd. Bajarê Strasbourgî yê Fransa de zî seba serragêrayîşê ronayîşê PKKyî şewêk ameye organîzekerdene. *BRUKSEL*

# WhatsApp êdî bi kurdî ye!


Êdî bikarhênerên sepana WhatsAppê dikarin bi kurdî bi kar bînin. Yek ji hezkiriyê zimanê kurdî ku li ser teknolojiyê xebatan dike, Gernas Nenas WhatsAppê wergerand kurdî û got ku êdî bikarhêner dikarin WhatsAppa kurdî daxînin û bi kar bînin

**Bîlal GULDEM / AMED – MA**

Di warê teknolojiyê de pêşketinek din jî li kurdî zêde bû. Sepana peyamşandinê û lêgerandinê ya xwedî taybetmendiyên xwe ya navbera platforman WhatsApp Messenger a ji bo telefonên jîr êdî bi kurdî ye. Naveroka hemû beşên WhatsAppê bi kurdî hat amadekirin. Kesên ku dixwazin WhatsAppê bi kurdî bi kar bînin dikarin peyda bikin û daxînin telefonên xwe.

Di cîhanê de yek ji sepana ku herî zêde peyam pê tên şandin WhatsApp ku bi kurdî hat amadekirin kêfa bikarhenerên kurd jî anî. Yek ji hezkiriyê zimanê kurdî Gernas Nenas ê ku di warê amûr û videoyên teknolojiyê li ser kurdî dixebite demek dirêj bû ji bo ku WahatsAppê wergerîne kurdî dixebitî û vê xebata xwe temam kir.

Nenas bi qasî mehekê dema xwe da ser çêkirina WhatsAppa kurdî û bi sepana bernameya bi navê APK Edîtor a di telefonê de çêkir. Nenas behsa xebata xwe kir. Nenas anî ziman ku zimanê kurdî ne tenê zimanê axaftinê ye di heman demê de zimanê nivîsandin û xwendinê ye û wiha got: "Pir fikirîm li ser teknolojiyê. Çima em teknolojiyê bi zimanek din bi kar tînin. Lewma min xwest êdî WahatsAppa kurdî jî hebe. Min çend caran bi WhatsAppê re têkilî danî lê bersiveke erênî nedan. Xwe nêzî WhatsAppa kurdî nekirin. Min li ser sepanê APK Edîtor ewil ji bo xwe ceriband. Piştî min ceriband serkeftî bû û min dît ku tê wergerandin. Piştre ez fikirîm ku çêbikim û vê sepana kurdî belav bikim."



**'Bi vê xebatê şa dibim'**

Nenas diyar kir ku ji ber ferhengek peyvên teknolojiyê nîne di warê bicihkirina peyvan de hinek zehmetî kişandiye û wiha dewam kir: "Ji bilî zehmetiya peyvan, wekî din ev xebat xweş dimeşe. Xebata kurdî ji bo min cihê kêfxweşiyê ye. Pê şa dibim û nawestim. Dixwazim vê yekê jî bêjim dibe ku hin peyv 'çêker bin' ji ber vê yekê jî lêborîna xwe ji bikarhêneran dixwazim. Ji bo alîkariya hemû heval û dostan jî spasdar im."


Nenas da zanîn ku ji destpêkê heta dawî hemû beşên wê bi kurdî ne û wiha got: "Heke bikarhêner rabin tê de bi tirkî binivîsin ne bi kurdî ye lê heke bi kurdî binivîsin her tiştê wê dibe kurdî. Hemû naveroka wê bi kurdî ye. Va me çêkir îcar dora bikarhênera ye. Ez daxwaz dikim ku tê de bi tirkî neni-vîsin. Em hêvî dikin ku dê hemû bikarhêner ji heval û dostên xwe re par ve bikin û wê WhatsApp jî bibîne ku va kurd xwedî li zimanê xwe derdikevin. Belkî êdî ew ji bi awayekî fermî bi zimanê kurdî WhatsAppê çêbikin ku em dikaribin daxînin."

**Li ser teknistan.com'ê tê daxistin**

Nenas destnîşan kir ku ew ê sepana WhatsAppa Kurdî li ser malpera http://teknistan.com/ dê belav bikin û wiha got: "Em ê ji bo daxistina WhatsAppê hemû tiştî binivîsin li ser malpera teknîstanê. Daxistina wê zor nîne. Teînê li şûna ku di Play Storeyê de daxînin, dê li ser teknîstanê daxînin. Her tişt eynî ye. Ne hewce ye pê li tiştekî teknîkî bikin, dadixînin û saz dikin."

Nenas got ji ber ku WhatsAppa kurdî ji şirketa WhatsAppê re ne fermî ye qebûl nake ku Play Store sepanê bide belavkirin. Nenas da zanîn ku di sala 2016'an de jî serwîsa peyam şandinê Telegram jî wergerandiye kurdî û sepana "lîstika peyva" ya bi kurdî çêkiriye û bernameya "lîstika milyoner" jî wergerandiye kurdî û li ser Play Storeyê tê peydakirin. Nenas her dawî got WhatsAppa kurdî ku hatiye çêkirin tenê ji bo telefonên Androîd hatiye amadekirin.

## Yekrêziya nava malê



**Hawrê KIRÊKAR / SILÊMAN - ROJNEWS**

Hunermendên tev li dîdara hunerî ya Germiyanê bûn li ser rola hunerê û yekitiya gelê kurd axivîn. Hunermendan diyar kir ku yekitiya her çar parçeyên Kurdistanê û pêkanîna yekitiyek neteweyî ya gelê kurd gelek girîng e.

Hunermend Serbest Ehmed axivî û wiha got: "Ji bo hunerê rêxistinbûna kurdan ji hemû tiştî girîngtir e. Pêwîst e huner ji bo komkirina hunermendan kar bike, li ser vê yekê hewldan hene lê hêjî kar tê xwestin. Ji bo rewşa niha ya kurdan, yekitiya nav mala kurdan ji her tiştî girîngtir e. Divê ji bo yekitiya neteweyî hunermend li her çar parçeyên Kurdistanê kar bikin."

Hunermend Eswed Fayiq jî axivî û got ku mixabin hunerê nekariye yekrêziya nav mala kurdan de bike yek û wiha pê de çû: "Pêwîst e huner di pêşxistina yekrêziya nav mala kurdan de xwedî cihek diyar ba. Yekitiya neteweyî bi vê hunera niha çênabe, ji ber pêşbaziyên gelek ne xweş hene."

Li gorî hunermend Pişko Mihemed jî, huner hewl daye yekrêziya nav mala kurdan çêbike. Lê ev pêngavên destpêkê ne, pêwîst e hewldanên zêdetir ji bo vê yekê bên dayîn. Pişko got ku pêwîst e dîdarên sînemayî û guftugoyên pêwîst e dinavbera hunermendên her çar parçeyên Kurdistanê de bên kirin û got: "Huner dikare rolek mezin ji bo aştî û yekitiyê bike. Ew hezkirina ji bo Kobanê, ya di nav huner û aliyên din de, îspata vê yekê ye."

## Li Şehbayê karê çand û hunerê

**Hîvda HEBÛN / ŞEHBA - ANHA**

Yekitiya Rewşenbîrên Efrînê ku sala 2016'an li Efrînê avabû, karê xwe li Kampa Serdemê ya li Şehbayê didomîne. Yekitiya Rewşenbîran ku li ser gelek beşên hunera kurdî dixebite, li kampê pirtûkxaneyek jî ava kiriye.

Hevserokê Yekitiya Rewşenbîrên Efrînê Ûsema Ahmed diyar kir ku ji bo berxwedana heyî bigihînin nifşên nû, ew têdikoşin. Ahmed ku helbestvan û rexnegir e, îşaret bi van xusûsan kir: "Em jî tevî gelê xwe derbasî herêma Şehbayê bûn. Du mehan, navenda me tune bû. Me karê xwe di nava gel de dikir. Piştre me navendek ava kir. Di vî şerî de hem ji gel, hem jî ji şervanan gelek şehîdên me çêbûn. Me xwest, arşîva vê pêvajoyê çêbikin û aliyê wê yê wêje, dîrok û sînemayê xurt bikin. Bi vî rengî me kar di nava xwe de dabeş kir. Abdullah Şikakî wê aliyê wê yê dîrokê binivîsîne, Heysem Mistefa û Mehdî Erselan aliyê wê yê sînemayê. Van hevalan dest bi kişandina film û kurte film kirin. Em aliyê wêjeyî yê dîroka nivîskî diafirînin."

Ahmed têkildarî xebatan wiha axivî: "Me dewreya perwerdeya çîrokan vekir. 17 şagirtên vê perwerdeyê hene. Çar meh in dewam dike. Yê herî kêm nivîsî, çar çîrok nivîsîn. Şagirtekî me 23 çîrok nivîsîn. Piştî perwerdeya çîrokan, me dest bi perwerdeya senaryoyê kir. Wekî din xebatên me yên li ser şanoyê hene. Li ser çîroka şehîdên berxwedana serdemê em pirtûkekê amade dikin."

Ûsema Ahmed diyar kir ku gelekî girîng û hêja ye ku gel di nava van şert û mercan de têdikoşe û hewl dide çanda xwe biparêze.

**Zarok tên perwerdekirin**

Xelîl 13 salî ye û xwendekarê pola 8'an e. Yek ji zarokên Efrînê ye ku her roj tev li perwerdeya senaryoyê dibe. Tevî emrê xwe yê biçûk, haya wî ji bûyerên bi serê wan ve hatiye, heye. Dibêje: "Dema ji Efrînê derketin, em gelekî êşiyan. Ji ber vê yekê em hestên xwe hewl didin bi helbest û çîrokan bînin ziman. Ez helbestan dinivîsîm. Mijara helbestên min Efrîn e. Pênc salan me li Efrînê bi kurdî perwerde dît. Bi saya vê perwerdeyê, me dîrok, ziman û erdnîgariya xwe nas kir. Tevî şert û mercên giran jî em ê dest jê bernedin. Em ê koledariyê ti carî qebûl nekin."

Selam Îbo ku karê şanoyê dike û tev li perwerdeya senaryoyê dibe, anî ziman ku Şehba jî rûpeleke dîrokê ye. Dengbêj-nivîskar Mihemmed Welîd jî got, perwerdekirin û pêşvebirina xwe, beşek ji berxwedanê ye.

**Pirtûkxaneya li kampê**

Endama Yekitiya Rewşenbîran Avesta Îbrahîm berpirsyara pirtûkxaneya li Kampa Serdemê ye. Li ser pirtûkxaneyê got, "Ev pirtûkxaneya li Kampa Serdemê vebûye, li cîhanê yekane ye. Ji ber ku heta niha li kampeke penaberan pirtûkxane nehatiye vekirin. Ev pirtûkxane di nava şert û mercên gelekî giran de hate avakirin. Me hemû pirtûkên wê jî ji malan û ji binê enqazan derxist. Nexasim pirtûkên zarokan û yên kurdî gelekî balê dikişînin. Em li bendê ne ku ji derve alîkariya pirtûkan ji me re bê dayîn."

**Wêneyên berxwedanê**

Ji Yekitiya Rewşenbîran wênevan Erdalan Îbrahîm li atolyeya wêneyan tabloyên berxwedana Efrînê amade dike. Erdalan Îbrahîm diyar kir, ew xwe ji bo projeya pêşangeha wêneyan a li ser berxwedana Efrînê amade dikin û got, tevî zor, zehmetî û êrîşên giran, wê di wêneyên xwe de berxwedan û têkoşîna gel raxin ber çavan.



## Zehra Dogan wêneyê Sîsê Bîngol xêz kir

Rojnameger û şêwekara girtî Zehra Dogan di 25'ê mijdarê de ji Girtîgeha Tîpa E ya Amedê sewqî Girtîgeha Tipa T ya Tarsûsa Mêrsînê hat kirin.

Zehra Dogan bi girtiya nexweş Sîsê Bîngol re di heman qawîşê de dimîne. Tevî ku materyalên şêwekar Dogan nadinê jî bi pênûsrêçê wêneyê Sîsê Bîngol a 85 salî xêz kir. Piştî ku Dogan du wêneyên Bîngol xêz kir li ser hesabê wê yê tora civakî twîtterê hat parvekirin. *MÊRSÎN*







## Şanoya Mencelê bername aşkera kir

Bernameya Şanoya Mencel a meha kanûnê diyar bû. Şanoya Mencel dê bi lîstikên şanoya jixweberî û "Kozik" derkeve pêşberî şanohezan.

Şanoya Mencel dê bi çalakiyên cuda derkeve pêşberî şanohezan. Di bernameya Mencelê ya vê mehê de pêşandan stand-up a bi navê "Te Dît" a Abdullah Tarhan, lîstika "Kozik" a jinan û lîstên "Jixweberî" hene.

*Dê hemû lîstik saet di 19.00'an de bên pêşandan. Bernameya meha kanûnê wiha ye:*

- ✓ 14'ê kanûnê roja înê - Kozik
- ✓ 15'ê kanûnê roja şemiyê - Jixweberî
- ✓ 16'ê kanûnê roja yekşemê - Kozik
- ✓ 21'ê kanûnê roja înê - Jixweberî
- ✓ 22'ê kanûnê roja şemiyê - Kozik
- ✓ 28'ê kanûnê roja înê – stand-up "Te Dît"
- ✓ 29'ê kanûnê roja şemiyê - stand-up "Te Dît" *WAN*



## Rojên Belgefîlman ên MAFÊN MIROVAN

Wê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (THÎV) îsal 9'emîn Rojên Belgefîlman ên Mafên Mirovan di 5-8'ê kanûnê de li dar bixe.

Dê mîhrîcan bi hevkariya Civata Xebatên Zankoya Ragihandinê û Navenda Çanda Fransî bê lidarxistin. Her wiha wê di mîhrîcanê de bi derhênerên belgefîlman re gotûbêj jî bên kirin. Di çarçoveya bernameya mîhrîcanê de dê gelek filmên kurdî, tirkî û gelek welatên din bên pêşandan. *ÎZMÎR*

www.arsivakurdi.org